# BELAVOK

*SAMBU- komeke Nirxandinê ye û dema meriv bi tirs û endîşeyê di demeke zû de pê bihese weke mînak di pêşdibistanê an jî di dibistanê de. Di koma SAMBU de kesên bi rêya hevkarî di demeke zû de ji bo zarok,cîwan û malbatên wan dikarin alîkariyeke bi rêkûpêk bidin hene da ku zarok ji bo cîh û saziyên rast bên şandin.*

## Ji bo kê

Koma SAMBU ya li Lidköpingê ji bo zarok û cîwanên di navbera salên 0 – 20 de kar dike.

## Çawa bi rê ve diçe

Dema kesek li ba zarokek an jî cîwanek endîşeyekê kifş bike hîngê ew endîşe ji bo berpirsê herî nêz re te şandin. Dema meriv bigêhê wê encamê ku ji bo alîkarîkirinê zêde kes pêwîst in hîngê bi koma SAMBU re têkîlî tê çêkirin. Dema destûra nîvîskî lazim be wê demê jî bi serperiştan re pêywendî tê danîn ji bo ku ew mijar bikeve rojeva koma SAMBU.

## Lewma SAMBU heye

Ji bo ku bikarin bi rêyeke zû û saxlem alîkarî bidine zarok û cîwanan ew kes û saziyên di nav kar de ku xwedî zanyarî û tecrube ne divê bi hev re di nav hevkariyê de bin.  Di nav koma SAMBU de hemahengiyeke wiha heye. SAMBU derfetê dide ku ew kar û pirsgirêkên ku di demên zû de hatine kifşkirin li ber çavan bigire û da ku bi vî hawî jî alîkarî û piştgiriya rast bê dayîn. Bi dêûbavan re têkîliyeke di nav hefteyekî de tê çêkirin piştî ku koma SAMBU bi hev re rûnişt û bi pişt re mesele ji bo saziya guncav tê şandin. SAMBU weke piştgir û şêwirmend ji bo her kesê bi rêya karê xwe bi zarokan re di têkîliyê de ye kar dike.

## Ku bixwazim zêdetir agahdar bim

Di derbarî SAMBU-Lidköping de zêdetir agahdarî li malpera lidkoping.se/Barn och utbildning/Stöd û her wiha li beşa tenduristiyê ya diboistanê heye. Li wê derê tu dikarî bibîni ka kî di vê komê de kar dike û civînên wan kîjan deman li dar dikevin. Ji bo te weke takekesê zana û profesyonel li wê derê maîla têkiliyê jî heye û her wiha form û kaxezên ji bo kar pêwîstiya te pê heye jî li wir hene.

Med stöd från

VÄSTRA GÖTALANDSREGIONEN

Lidköpings kommun

Vårdsamverkan Skaraborg